

Kedkar û karker û pale û hilberînerên biçûk û bêkar û cotkar û esnaf, di nav rewşeke dijwar a aborî û polîtîk de pêşwaziya lê Gulana 2018an dikin. Îro şert û mercên xebat û jiyanê mirovane her ku diçe xerabtir dibe.

Li aliyekî zext û kedxwariya bêhed û bêhesab a sermaye û dewletê... Li aliyê din polîtîkayên şer ên ku desthilatî li Tirkiye û li deverê dide meşandin... Koalîsyona AKP-MHPê,

- **Bi sîstema KHKyan, grev û têkoşîna ji bo bidestxistina mafan tê qedexekirin.**
- **Bi OHALê, têkoşîna mafdar a kedkar û karkeran tê çewisandin.**
- **Mafên bidestxistî yên kedkaran tê çopandin.**
- **Bi taşeronî, bi kirêkarî û bi şertên bêewle yên xebatê, polîtîkayên li dijî kedkaran tê meşandin.**
- **Tendurustiya karkeran û ewlehiya karkeran tê piştguhkirin. Karker, di tawanên kar de tîn kuştin, rastî nexweşiyên pîşeyî tîn.**
- **Keda jinan a navmalê bi awayekî giran tê xwarin.**
- **Desthilatî kedkaran parçe û dabeş dike, berberiyê di nav wan de derdixe. Nanê kedkaran bi budceya şer û çekdarkirina civakê didize. Çareserkirina pirsgerêka kurd û daxwaza civakê ya demokrasîyê bi polîtîkayên şer asteng dike.**

Li dijî van zextên giran, li dijî talankirina siruştê û kedxwariyê, ji bilî berxwedan û têkoşîna me ti riyeke din nîn e.

Me hêz, xîret û biryardariya xwe ji 8ê Adarê, ji Newrozê wergirt û em lê Gulanê jî li her derê, li qadan bin. Em yekîtiya xwe, têkoşîn û palpiştî û piştevaniya xwe xurttir bikin.

**Bijî Yekê Gulanê!
Yaşasın 1 Mayıs!**



BIJÎ

1Ê GULANÊ

JI XEBATA BÊEWLE RE

JI TAWANÊN KAR RE

JI OHAL Û ŞER RE

QADA MÎTÎNGÊ:

SAET: